

Kontiroolkirina

“Corona”yê şiyana rejîma

Tehranê nîşan dide!

»»» R:7



Kero nemire

buhar e giya şîn

bû qîfar e

»»» R:4




Bicihkirina

sîstema Patrîotê li

kurdistan û Îraqê

»»» R:5



Heya dujmin

hakim be rewş

ji ya heyî baştir

nabe

»»» R:6



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (371) 05-04-2020 Buha (1000) Tûmen


10`ê Xakelêwe nîşana parastina jiyanê

Her neteweyek xwediyê komek nîşane û rojên taybet e ku bi giştî di dem û cihên xwe de dibin sembola nasîna wê netewê, rojên salê bo netewa Kurd pir in ji rojên xweş û nexweş, pir in ji rojên çalakî û xweragirî û berxwedanî, ti rojek di salê de nîne ku çalakî û xweragiriya xortên Kurd tê de nehatibe nivîsîn.

Yek ji wan rojan, ku heya niha jî taliya wê di bîra hemû Kurdekî nîştimanperwer de ye, lê bûye nîşane û sembolek bo xweragirî û piştevanî ji pîrensîpên exlaqî û nîştimanî bo netewa me, û ew jî 10`ê Xakelêwe ye!

Di 10`ê Xakelêwe de ku Pêşewa Qazî Mihemed di bi nav dadgehên rejîma Şah de bi moraleke baş û bi lehengî û netirsî berevanî ji xwe û Komara Kurdistanê û herwisa mafê netewa xwe dikir, di qada Çarçira a Mihabadê de, ew cihê ku Komar tê de ragihandibû, îdam kirin. Ger rejîma Pehlewî Pêşewa û hevalên wî îdam kirin heta ku bi hêviyên xwe yên vala, gelê Kurd bi yekcarî derheq mafên xwe de bêhêvî bike, lê nezannîn mirina Pêşewa bo gelê Kurd, dibe hêz û

zindîbûneke dubare bo gelê Kurd. Ji wê demê ve zêdetir ji 7 dehikan derbas dibe; gelê Kurd ne tenê ji xebata di pêxema mafê xwe de paşekêşî nekiriye, belkî bo bideştveanîna wan pêdagirtir bûye, û bi hezaran şehîdî daye ku di pêxema wan mafan de canê xwe goriyê azadiyê kirine, û di paşerojê de jî ew cangorîkirina heya gihîştin bi armancên gelê Kurd wê her dom hebe. Pêşewa û hevalên wî di 10`ê Xakelêwe de îsbat kirin ku pîrensîpên exlaqî û netewî û



piştevanîkirin ji wan, bo wan û ji wê sertir jî bo bawermendên bi azadiyê, li serweyî hemû tişteki ye, û bi xwîna xwe ew waneyên girîng û dîrokî bi nîfşa li pey xwe dan; Roja 10`ê Xakelêwe wekî roja Şehîdên Kurdistanê binav kirin, û hemû salekê xelkê tekoşer ên Kurdistanê di wê rojê de bi nîşaneyên rêzgirtin ji xebat û cangoriya wan şehîdan û tev şehîdên Kurdistanê wê rojê bilind dinirxînin, û bi bê dudilî û ti tirsekê di wê salvegera dîrokî de bi lidarxistina çalakiyên cuda ên banghêjî û serdana tîrbên şehîdên Kurdistanê û serdana malbatên şehîdan, emegnasiya xwe û pir ji rêvîngbûna rêya wan nîşan didin.

Îsal cudatir ji salên berê bi sedema hatina vîrûsa pîs a Koronayê, tekoşerên rêya Pêşewa û nîştimanperwerên Kurdistanê, wekî erkek netewî di çepereke din de bi hewl û mandûbûna xwe

têdikoşin ku nîştimana xwe, ku hezaran şehîd bo dane, ji belaya vîrûsa koronayê biparêzin. Roja 10`ê Xakelêwe, di dîroka xebata rizgarîx-waziya xelkê Kurdistanê de, hekî ji aliyekî ve rojeke tal û nexweş tê naskirin, ji aliyekî din ve jî bi roja nûkirina soz û peyman û nîşandana yekgirtinê bona bideştveanîna armancên tevgera netewî-demokratîk a xelkê Kurdistanê tê hesabandin.

Li ser vê yekê û bi bîranîna 73`emîn salroja îdamkirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, hey`eteke rêberatiya PDKÎ bi berpirsariyê Ci-hgirê Yekem ê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Hesen Şereffî”, bi nûneratiya endamên rêberatiyê, malbatên serbilind ên şehîdan, kadr û pêşmerge û endamên PDKÎ, serdana goriştanên şehîdên Kurdistanê kir û destgula rêzgirtin û emegnasiyê li ser tîrba şehîd “Seyîd Selam Ezîzî” danî.

“Şereffî” tevî bilindnirxandina bibîranîn û yad û bîra Şehîdên Kurdistanê ragihand: “Îro em bona parastina tendurîstiya canê hevalên pêşmerge û tev xebatkarên Demokrat, bi hegera belavbûna vîrûsa Koronayê, bi nûneratiya hemûyan, me serdana goriştana şehîdan kir, ji ber vê yekê ku felsefeya kar û xebata hemû şehîdên Kurdistanê û serweyî hemûyan Qazî, Qasimlo û Şerefkendî, ji parastina jiyan û kerameta mirov pêk hatiye.

Herwisa tekoşerên Demokrat û rêrevên rêbaza Pêşewayê tim zindî di Rojhilatê Kurdistanê de, îsal bi serdana goriştana şehîdên tim zindî û malbatên serbilind ên şehîdan, tevî bi bîranîna yad û bîra wan, soza xwe li ser rêbaza Şehîdên Kurd û Kurdistanê nû kirine, û ragihandine ku hevawayê Pêşewa Qazî Mihemed, pêdegir bin li ser rêbaza wan, heya gihîştin bi “lûtkeya” azadiyê.

10`ê Xakelêwe, tevî vê yekê ku roja nûkirina peymana digel rêbaza şehîdan e, roja îsbadkirina hebûnê ye; selimandina hebûneke pir wate ku nasnamê bo gelê me diyarî dike, nasnameyek ku me ji yên din cuda dike ku xala cudakirinê dibe hewldan bona avakirina binyata welatekê li ser bingeha exlaqî û rêzgirtin ji kerameta mirovî.

Bilind be roja 10`ê Xakelêwe, roja Şehîdên Kurdistanê

Sergotar

Civaka “tak”an

N: Kerîm Perwîzî

Baseke girîng û gengeşeyêke mêmîn di navbera du rewten hizrînê de hene, û pêk tê ji wê ku di navbera tak û civakê de kîjan ji wan li pêşê ne, û xweştek û biryar û berjewendiyên kîjanê li pêşê ne.

Ev basa fikrî du serên pergîr hene, ku yek ji wan, tak wek binema girtiye, û dibêje ku, hemû demekê dibe civak û yasayên wê bikin qurbaniya berjewendî û azadiyên tak, û bîrkirina herî tund jî li ser vê baweriyê bûye, ku civak bîngeha bîrkirin û darêtina hizr û yasayê ye, û tak ti pêgeheke wê nîne, û dibe ku di hemû rewşekê de, bikin qurbaniyê civakê. Di navbera wan du qutbên pergîr de jî, bîrkirina navgîngîr jî hebû, ku hewl didan balansê ragirin.

Lê bi dirêjahiya aliyê kêrî dîroka hevçerx, ew bas û gengeşeya negihaye encamê, û her aliyekî fikrî mînak selmîner ji xwe re dîtiye, û hikûmet jî li gora berjewendî û siyaseta roj û demê, yek ji wan berçav girtine, û peyrewî jê kirine.

Lê niha nexweşiyek û di rastî de meredeke cihanî hatiye, ku hemû kuncêke cihanê bi xwe ve girtiye, û tu welatek bi dûr ji nexweşiyê nebûye û nabe. Jî wê jî grîngtir ew e ku, ev nexweşiya, hejar û dewlemend û bêdeshilatan li hev naveqetîne, û hemû kes li metirsiyê de ne.

Mereda Koronayê gellek tişt bi civakê dane hilweşandin, û gellek reftar bi dawî anîne, û piştî bidawîhatina vê meredê jî, bi xatircemî ve, cihana piştî koronayê, êdî wek koronayê nabe. Lê di vê basa hîlbijartinê di navbera tak û civakê de jî, mereda koronayê hinek gotinên wê hene,

Mîstefa Hicrî: Şehîdên me rêberên me ne



Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, “Mîstefa Hicrî”, bi hilkefta 10`ê Xakelêwe salvegera Şehîdên Kurdistanê peyamek belav kir.

Peyam wiha ye:

Şehîdên me rêberên me ne, wan em agehdar kirin û wan siloganên xwe kirin bi kiryar û ber bi pêş ve pêngav avêtin. Lewma domandina rêbaza wan bi kiryar, domandina rêya wan bi zanişt û îradeya şoreşvanî ye.

Em Di 10`ê Xakelêwe, roja Şehîdên Kurdistanê de, bejna xwe di hember Pêşewayê nemir “Qazî Mihemed” û hemû şehîdên rêya rizgariya Kurd û Kurdistanê de ditewînin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

9`ê Xakelêwe a 1399`an

28`ê Adar a 2020`an

ku hewce ye guhdariya wê bê kirin, û bîr jê bê kirin bo siberojê.

Mereda koronayê ji vîrosa yek mîkronî ve deşt pê dike ku tu çaveke wê nabîne, û diçe nava leşê mirov, û rege heya du hefteyan tu nîşaneyek jê dernekeve! Lê gellek bi sanahî dikare di vê heyamê de ji leşekê ve veguhêze bo kesekî din! Ne tenê miroveke din belku bi şeweya rêjeyî dibêjin ku her tûşbûyek dikare sê kesên din tûş bike, ew jî di heyama çend çirkeyan de!.

Bi vî awayî em dibînin ku çend mehan dikêşe da ku hejmara tûşbûyiyan bigihîje sedhezhar kesî, lê di çend hefteyan de, digihîje yek milyon kesî û di rojên bê de, dibe dehan milyon kes!!

Ev vîros herçend ku bixwe derd û jan û nexweşî li pey xwe heye, lê wekî hêleke fosforî riyên çûna xwe diyarî dike û cardin nîşan daye ku zincîreya pêwendiyên mirov heya çî radeyekê bi hev ve girêdayî ne!.

Ger kesekî caran bîr dikir ku tenê bixwe girîng e, û çî belayek tê serê civakê bila bê, lê niha tak jî rastî eş û azarê dike. Her li vir jî selimandine ku wisa nîne ku ger takeke dûrdeşt li welatekî dûrketî azarê bikêşe, pêwendiya wê bi mirovên civaka din ve nîne, û ew dikarin bi asûdeyî bijîn.

Korona dibêje me ku, di navbera civak û takekesan de, tu yek ji wan li pêş nînin, belku civak ji takekesan pêk hatiye û asûdeyî û eşa her yek ji wan jî asûdeyî û eşa yên din e. Hêlên fosforî ên Koronayê bi me selimandine ku takê veqetiyayî tuneye, û civaka bextewer ew e ku takên wê bextewer bin. Vîrosa koronayê digel hemû nexweşiyên xwe, dubare anî bîra me, ku em çî jîndareke zindî ne, û çawa hewcehiya me bi hev heye, û em bi hev ve girêdayî ne.

Peyama Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanî Îranê bi hilkefta 10`ê Xakelêwe

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanî Îranê bi hilkefta 10`ê Xakelêwe, salvegera şehîdkirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, peyamek belavkirin.

Deqa peyamê wiha ye:

Hemû xelkê Kurdistan!

Azadîxwaz û welatperwerên Kurd!

73 sal beriya niha, di sibêzûya roja 10`ê Xakelêwe a sala 1326 a Rojî de, rêberê Partiya Demokrat a Kurdistan, Serkomar û avakerê Komara Kurdistanê wekî yekemîn kiyana siyasî ya Kurd, “Pêşewa Qazî Mihemed” digel Wezîrê Berevanî yê Komara Kurdistanê, General “Mihemd Sêyf Qazî”, Nûnerê xelkê Mihabadê di Parlemana Îranê de, “Ebulqasimê Sedir Qazî”, di meydana “Çarçira” a bajarê Mihabadê de, ji aliyê celadên rejîma Pehlewî ve bi sêdarê dan û berdwamiya rêbazê bona gihîştin bi armancên bilind yên Komara Kurdistanê bi xortên netewa xwe spartin.

Biryara îdamkirina “Pêşewa Qazî Mihemed”, berê û di encama dadgehîkirina nedadperwerane ji aliyê dadgeha leşkerî a rejîma dîktator a Pehlewî ve, li 3`ê Rêbendan a sala 1325`an hatibû dan.

“Pêşewa Qazî Mihemed” wek kesekî afirankarê dîrokê û kesayetiyeke bi bîr û bawer bo armancên pîroz yên rizgariya netewî, roleke girîng di dariştina binyata nasnameya netewî a modern a Kurd û kanalîzekirina seha welatperweriya xelkê Kurdistanê bona gihîştin bi armanca avakirina kiyaneke serbixwe a Kurdî hebû.

Di qonaxa heştiyar a dawiya salên şerên cihanî yê 2`an de ku bi hatina hêzên hevpeyman bo başûr û bakurê Îranê, valatiya hêz û lihevhatina hizra netewexwazî di devera Mukriyanê de pêk hatibû, rêkxistin û livehanîna qa-

tên cuda yên civaka Kurdistanê û avakirina yekîtî û hevxebatî digel netewên ciran yên Kurd bo bideştveanîna armanca rizgariya neteweya Kurd, hewcehî û erkeke dîrokê bû ku “Qazî Mihemed” wekî kesayetiyeke jêhatî û rêberekî cangorî û xwedî pêgeh di nav civakê de, karî wê erkê bi serketinê cî bi cî bike.

Rola wî di rêberîkirina Komar û hewldan bona rêkxistinkirin destketên zêdetir bo netewa xwe û herwisa pêbendbûn bi soza xwe ku di dema sundxwarina Serkomariya xwe de bi gel û welatê xwe dabû, Qazî Mihemed di dîroka Kurdan de kire stêrkekî pir rûnahî ku li hemû şoreşên piştî xwe di 4 aliyên Kurdistanê de îlham jê wergirtine.

Berevaniya xweşmêrane ji mafê rewa yê netewa xwe di dema dadgehîkirina wî de, yeyek ji rûnaktirîn rûpelên dîroka hevçerx a Kurd e, bi awayekî ku derfeta bergirî ji xwe dike, belgenameyeke fermî û manîfêsteke şoreşvane bona bergirî ji mafên rewa yên netewa xwe û îsbatkirina rewatiya armancên Komarê. Lewma bi gotina yek ji efserên payebilind yê rejîma Pehlewî jî, ew Qazî Mihemed bû ku desthilata dagîrker dadgehî dikir.

Pêşewa di dema dadgehîkirinê de heya yek pêngav jî ji bawera netewiya xwe paşwe naçe û dema ku beşdariyên Kurdên aliyên din yên Kurdistanê di Komarê de wekî yek ji tohmetan li ser Pêşewa bas dikin, Pêşewa bi eşkere dibêje, ku ew di wir de bihanî nînin û Kurdistan axa hemû Kurdan e, dema ku dadwer jê dipirse sozê didî ku gotinên te bo dadgehê rast bin? Bersiva Pêşewa Qazî eve ye ku: “Hekî di gotinên min yên berevanîkirinê de ez bi corekê axivîbim



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

ku bi keyfa we be, bizanin ku di wir de min rast negotiye”. Bi wî awayî axivtina netirsane û meznahiya xweşmêriya Pêşewa di ber darê sêdarê de rênîşander û nîşandekeke heta hetayî bo xortên netewa Kurd û heya hemû mirovên şoreşvan û xwedî helwest di gişt cih û demekê de ye. Pêşewa di jiyana siyasiya xwe de tim cihê hitbar û baweriya hemû tex û qatên civaka Kurdistanê bû û xwe bo paraştina mafên wan û rêzgirtin ji tolêrans û bi hev re jiyana aştiyane di navbera wan de paybend dizanî, lewma piştî jî ku di wesiyetnameya xwe de bi awayekî taybet pêdagirî li ser wekheviya gelê Kurd û dîrxistin ji dijatiyên di navbera kesan û pêkhatên civaka Kurdistanê de dikir û wekhevî û yekhelwestî bi kilîta serketin û gihîştin bi armancên rewa yên gelê Kurd dizanî.

Lisêdaredana wî rêberê mezin yê dîroka Kurd, hewleke serneketî a faşîzma dagîrkerê li ser welatê me bo şikeştina tevgerqa rewaya Kurd û jinavbirina waneya xweragirî û hizra netewa wî bû, lê nek her serneket, belkî wekî Pêşewa ku di bêdadgeha Pehlewî de jî îşare pê kiribû, ji her dilopeke xwîna wî, bi hezaran Qazî Mihemed serî hildan û bi dirêjahiya 7 dehikên derbasbûyî, waneyên wî yên nasnamexwazî û cangorîkirin û xebata tekûşerên Kurd di 4 aliyên Kurdistanê de û hemû aliyên siyasî yên xebatkarên tevgera Kurd de bûne û xevna jinavçûna Kurd û Kurdistanê bo dagîrkeran têk daye.

Di 73`emîn salvegera şehîdkirina wî rêberê mezin yê Kurd de, Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanî Îranê tevî pêdegirî li ser wekhevî û hevxebatîyê di pêxem bideştveanîna armancên Pêşewa û hemû şehîdên rêya rizgarî û dadperweriyê de, silav dişîne bo canê paqij ê hemû xebatkarên şehîd ên nîştiman û xwe bi domkerê rê û rêbaza wan dizane.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistan a Îranê

9`ê Xakelêwe a 1399`an

Kero nemire buhar e giya şîn bû qîfar e



N: Elî Munezemî

Di heyamê wan çend salên derbazbûyî de, Ayetulla Elî Xameneyî, rêberê Komara terorîstî a Îslamî a Îranê di çaxê newrozê de peyamekê belav dike û di wê payama xwe de li ser bingeha pirs-girêkên ku pêsîra rêjîma wan girtî, sala nû bi navekê navdêr dike ku ew nav zêdetir wek vizyonekê bo balkişandina karbidestên wê rêjîma terorîstî û handana wan e ku di pêxema wê xiyalê de cehd bikin. Li heyamê wan çend salan de 65% ew navên ku Ayetulla Xameneyî li sersalê danîne, bi awayekî rasteraşt yan jî nerasteraşt bi pirs û pirs-girêkên aborî ve pêwendîdar in. Di newroza îsal de, an ku 1399'an ya Rojî, wî navê «pêşxistina berhemên» daniye ser wê salê. Ewê di demekê de ye ku xêncî hindê ku Îran semxatirê meyandina Oraniyomê raştî cezayan hatiye û di zaf aliyên aborî de dorpêç li ser e, li ber nexweşîya korona a Îranê de rewşek awarte hatiye pêş. Di wê gotarê de emê faktorên alikar û yên lempêr li ser rêya «pêşxistina berhemên» di Îranê de şirove bikin.

Her kesek ku heta li zaniştên sereke yên birêveberî û produksiyonê fam bike, baş dizane ku birêveberê her fabrikayekê bo ku bikaribe asta berhemên xwe bilind bike, pêdiviyê ku aliyê herî kêmtir çend faktorên sereke li ber çav bigre ku girîntirîn wan ew yeka ye ku berhemên dibe xwe digel bazarê û asta daxwaza kirîna rêkbêxê û

astengiyên ser rêka wê pirsê peyda bike û bizanibe ku gelo ew daxwaza li bazarê bo kirîna tiştan heye, têrê dike û kîjan astengî li ser rê hene bo firotina zêdetir. Liberku eger asta berhemên zêde be, yê bibe sedemê hindê ku nirxa tiştan were xwar û eger berhemên jî kêmtir be, buhaya tiştan yê hind hilkişê ewraz ku bi zehmet xelk bikare bikre. Dema ku birêveber, bersiva wan pirsan peyda kir û zanî ku hem bazar heye û hem rêka firotinê têra xwe berfireh û vekirî ye û pêdiviyê ku asta berhemên xwe zêdetir bike, wî demê dikare ji rêya pêkanîna guhertinan yên tiştên fîzîkî, zêdetir kirina hêza merivî û yan jî bilindkirina asta kêrhatîbûn û produksiyonê ve tiştên zêdetir berhem bîne.

Gelo ew yeka bo fabrikayên di Îranê de dixebitin mumkin e?

Rewşa fabrikayan di Îranê de berevajî wê vîziyona ku rêberê rejîmê, Elî Xameneyî, diyarî kirî nîşan dide. Ji ber ku li gor ew zaniyariyên ku di rojnameyên Îranê de tên weşandin, her di serdema dewlata yekimîn ya Rohanî de pitir li 97 fabrikayên mezin di Îranê de hatin daxistin û li wan salên dawiyê de jî çendsed fabrika yan li devedevê daxistên de ne û yan jî hatine daxistin û bi hezaran kes bi wê hindê mane bê kar û derkevt.

Gelo reberê rejîmê qet haya wî li wan tiştan heye û li xwe pirsîye ku ew hemû fabrikayane çima tûşê wê rewşê hatine?

Kesek ku rêberê rejîmek tûtalîter be û hemû tiştêk bi emrê wî were kirin, nikare ku haya wî li



rewşê çinebe û li xwe nepirsîbe ku çima ew rewşa pêkhatiye. Dibe ku ew rewşa nirxek be ku wî bo gihîştin bi hindêk armancên din bi erzan zanîbe û ber hindê jî hazir bibe ku ew nirxa li ser hesaba xelkê û li berjewendiyê rejîmê bê dan. Ber hindê jî em dikarin bibêjin ku ew silogana ku Elî Xameneyî alaya wê bilind kirî, tenê bo hindê ye ku xelkê bixapîne û bo demek kurt wan bêdenig bike.

Ew rewşa ku îro rojê bi serê fabrikayan de hatî û miliyonan xelk jiyana wan ya rojane pê hatiye reşkirin, nirxa armanc û siyasatên şaş yê rejîma terorîstî û derevkar a Îslamî a Îranê didin. Karbidestên wê rejîmê bi sedema pêdagirî û tekoşîn bo berhemên çekên etomî û midaxilekirin di nav karûbarê welatên herêmî û çekirina metirsî û tehlûkeyan li ser xelk û welatên bîhanî bûne sedem ku dorpêçkirinên aborî li ser de bûne sepandin û jiyana xelkê raştî rewşek aloz û tijî tirs û xof were. Ew siyaseta xekek bû sedem ku bi bilindbûna nirxa pereyên bîhanî, fabrikayên navxweyî nekaribin bikevîne kêbirkê tevî berhemên fabrikayên bîhanî û ew yeka jî bo sedemê hindê ku pêşkevtina aborî, bilindbûna asta pêşesazî û hemû fabrikayên mezin yên pêşesaziyê bibe nerênî.

Gava ku deşthelatdarên rejîmê nekarî bi mudîriyet û rêveberiya dewletî rewşa fabrikayan baş bikin û wan li daxistnê xilas bikin, pîlanek gemartir dane pêşîya xwe û bi navê veguhestina wan fabrikayan bi pişka taybetî, ew sermayeya giştî xistin deştê xizm û kesûkarên xwe. Ew yeka jî ne di pêxema berhemên û pêşgirtin li îflas û sekinîna berhemên, lê li pêxema qazanc û deştdanîn li ser milk û malê wan fabrikayan hate kirin ku bo kesên kirîna qazancek mezin hebûn. Ji ber ku di serdema dewletîbûna wan fabrikayan de, bi gotina xudê karbidestên dewletê yên wek Huseyn Semsamî û Huseyn Elî Hacı Dilîganî, ew mudîyên zaf yek ji wan fabrikayan şarezaiya pêdivî di karê xwe de nebûn û di dema taybetîkirina wan fabrikayan de jî dewletê qet çî kontrolek li ser de nebû, ku gelo ew fabrika li arasteya berhemên wan tiştan de ku di dema radeştîkirinê de li ser rêkêtibûn, dixebitin yan ne.

Li ber wê hindê gava ku Xameneyî bas li bilindkirina asta berhemên dibe, mirov dikare wê gotina mezên kurdan jêre bibêje ku «kero nemre, buhar tê».

Bicîhkirina sîstema Patrîotê li Kurdistan û Îraqê



N: Dara Natiq

Di çend rojên borî de, rayedar û berpirsên serbazî yên Amrîkayê bi awayekî fermî di axavtinên xwe de behsa danîna sîstema Patrîotê û cihgîrkirina wan li çar cihên Îraq û herêma Kurdistanê kirin. Heya niha du ji wan sîstema berevanî a mûşekî bi navê patrîotê yek li binkeya leşkerî a “Eyn EL-Esed” ji parêzgeha Bexdayê û yek jî bo Hewlêr a Paytexta Kurdistanê hatiye veguhestin. Biryare du ji wan sîstemên din ên Patrîotê jî li welatê Kuwêtê ne, ku di pilana Pentagonê de ye wan jî veguheze bo Îraqê, lê nediyare ka ew yê li kîdera Îraqê werine bicîhkirin.

Cihgîrkirina sîstema berevanî a mûşekî li Kurdistan û Îraqê, dijkiyarên tund a rejîma Îranê li pey xwe ve anî û bi tundî ew kirya Amrîka rexne kirin û carek din gef û êrîşa serbazî û bi armancgirtina berjewendî û hevalbendên Amrîkayê di herêmê de xwarin. Lê ewa cara yekem nîne û bi dirêjiya temenê wê rejîma gemar û mirovkuj berdewam gefa li cîhan û nemaze Amrîka û Îsra'îl û hevalbendên wan dike û bo vê meremê jî her tim li çekirin û saportkirina girûpên terorîst û tundajo û danîna bombe û teqandina navendên Olî û biryarbideşt yê cîhanê û teror û têkdana tenahiya herêmî û bixasma destêwerdan ji kar û barê wilatên cîran rolek bilin û sereke liştiye.

Ya xuyaye ku Amrîka bi taybet piştî hatina serkar a “Trump”, bi awayekî micîd û berpirsane bo pêşgirtin ji gef û zêdexwaziyên rejîma Îranê û kurtkirina destê Îranê û kontroolkirina wê li saport ki-

rin û geşepêdana teror û destêwerdan ji karûbarên welatên herêmî û şer û aloziyên li herêmê û ya hemiyan girîngtir bo pêşgirtin ji çekirina çekên Etomî, gavên bi bandor girtin pêş û bi wekişan û betalkirina lihevhatina “BERCAM” ku bibû sedema hindê ku destê rejîmê bo hevkarîkirin bi girûpên terorîstî û têkdana tenahiya herêmî û çekirina mûşekên balîstîk û dîravêj û çekên etomî wekirî be û berdewam gefan li Amrîka û hevalbendên vê bike. dorpêçên berfireh û bandordar li ser Îranê hatin danîn.

Siyaseta Amrîkayê heya niha jî ya xuya ye ku guherîna rejîma Îranê nîne, belkî siyaseta kontroolkirina wê rejîmê girtiye pêşê. Ew jî bi vê wateyê ye ku Amrîka naxwaze rejîmê bibe xwediyê çekên Etomî. Ji ber ku hekî bibe xwediyê çekên etomî hem kontrol kirina wê zehmetir û pir hezînetir e û hem jî dibe sedema gef û xeterek mezin bo ser piroseya azadî û demokrasî û tenahiya cîhan û bi taybet herêmî. Herwisan Amrîka bi siyaseta kontroolkirina rejîmê dixwaze pêşî ji kiryarên terorîstî ên Îranê bigre û pêş bi vê hindê bigre ku Îran dixwaze li rêya tund û tûjî û kuştin û têkdana tenahiya herêmî guhartinan di wilatên herêmî de li gor berjewendî û îdolojî a daxîstî ya xwe çê bike. Amrîka bi pêşgirtina kiryarên tund li hember Îranê dixwaze ku rejîma wî welatî siyasetek normal û li gor yasa û zagonên cîhanî pêş bigr û xwe digel sîstema rêveberî a cîhanî û pirinsîbên wê rêk bixe û di warê aborî û siyasî de rikaberê tevî cîhanê bike û dest ji hevkarîkirina terorîzm û şer û aloziyên di herêmê de bîne û tenahiya welatên herêmê têk nede. Amrîka naxwaze digel rejîma Îranê bikeve şerek raşteras. Heya wê demê ku Îran li çekirina çekên etomî nîzîk nebe yan jî nebe hegera kuştina leşkeriyên Amrîkayî. Cara berê û li dijkiyara rejîma Îranê li hember kuştina Qasim Silêmanî yê terorîst, û avêtina çend mûşekan bo binkeyên leşkerî yên Amrîkayê ti leşkeriyek wan nehat kuştin. Lê Amrîka bo pêşgirtin ji wan mûşekên



Îranê ku zaf caran gefa hindê dîkin û ew dikarin Amrîka û hevalbendên wê bi armanc bigrin, sîstema berevanî a mûşekî bi navê Patrîotê li Îraq û Kurdistanê cihgîr dike û dixwaze bi tevahî liv û bizavên Îranê û girûpên girêdayî wê kontrol bike.

Di hemen demê de jî ragihandine, ku ew yê gorzek tund li girûpên ser bi Îranê ku sebebê alozî û têkdana tenahiya Îraqê ne bide û herwisan ragihandiye ku tev liv û bizavên Îranê di bin çavdêriya raşterast a wan de ye û ger ew bixwazin her gef û êrîş û şaşıyek bo ser berejewendiyên Amrîka û hevalbendên wê encam bidin yê raşterast binke û binyatên Îranê bi armanc bigrin û şerek raşterast bi Îranê re dest pê bikin.

Ji aliyekî din ve ji danana sîstema patrîot a li Hewlêrê wê yekê dide xuyakirin û herêma Kurdistanê xwedî pêgehek siyasî û dîplomasî a bihêz e bo Amrîka û cîhanê û ew yek bandora Kurdistanê li rojeva siyaseta aborî û dîplomasî a Îraq û herêm û nemaze cîhanê de zêdetir nîşan dide. Û yê bibe sebeb bihêztirbûna pêgeha herêma Kurdistanê di guhartina siyaseten herêmî de û bandora bizava rizgarîxwaz û azadîxwaz a Kurd di her warekî de bihêztr ji berê bixe rojeva siyaseta cîhanê.

Heya dujmin hakim be rewş ji ya heyî baştir nabe



N: Nûredîn Sofizade

Her wekî hemû aliyek di-
zane, ji hemû aliyekê ve
rojreşî û malvêraniyê bi ser
xelkê Îranê de girtiye.

Renge derd û bela û bûyerên
surûştî li heçî welat û ciheke
wê dunyayê de tiştekî surûştî
be, lewma di Îranê de jî ev
bûyerane çêdibin.

Lê ewa ku newekheve û dibe
cihê heyrîmanê, çawaniya
reftar û serederiya deşthi-
lata welatan e ku kanê çawa
mudîriyet dikin, çawa xisaran
kêm dikin, çawan di xema
xelkê welat de ne, çawa
alîkariya xisardîtiyan dikin û
çawan raştiya heyî dêxine ber
çavê raya giştî.

Di welatên pêşkevtî de ku
hikûmet xelkî be, bê guman
digel qewimîna heçî bûyer-
ekê deşthilatdar berî hemû
kesê xwe berpirsyar dizanin
û hemû cehda xwe dêxine ger
daku xisara herî kêm bigehe
xelkê welat, deşt bicih hemû
raştiya bûyerê û amara xisarê
dêxine ber çavan.

Di gelek welatan de ku
bûyerê biqewime û xisar
jê bikeve, hekî aliyê kêm
deşthilat û dewlet hatibine
sûçdarkirin, deşthilatda-
ran hem daxwaza lêbûrîna
ji xelkê kirine hem bona
nîşandana niyetpakiya xwe
deşt ji karê xwe berdane.
Di egera qewmîna her
bûyerê de deşthilat xwe
berpirsyar dizane û hemû
îmkanatekî dewletê didanê
xizmeta xelkê û cihê xisarê
bo xelkê tejî dike.

Lê di welatên dîktatorlêdayî
de hemû tiştek berevajiye.
Deşthilatên dîktator ti caran
xwe di hember can û malê

xelkê de berpirsyar nizanin. Belkî ew wekî zîloyê ketine miştina xwîn û malê xelkê û hekî
bûyerek jî biqewme û hindî xisara wê zêde be û hindî xelkê welat zêdetir perîşan be, ew rejîmên
dîktator bi qazancê xwe dizanin.

Rejîma Komara Îslamî ya Îranê jî berdewam derd û belaya xelkê û qewmîna bûyeran bo xwe bi
derfet zaniye bo paraştina sitûnên deşthilata xwe.

Deşthilatdarên rejîmê ku di heyamê 41 salên derbasbûyî de şer û alozî û belengaziya xelkê, bê
karî, deşturtî û dehan diyarokên civakî di nav xelkê de bo xwe bi derfet û “nê`imeta îlahî” za-
nîne.


Rejîm wisa dizane ku hindî xelk tûşê bûyeran be û mijûlê çareserîya derd û perîşaniya xwe be,
hind ji fikra dijayetiya rejîmê û xebata bona gihîştina bi azadiyê dûr dikevin.

Lewma bê guman rejîma “Wilayeta feqîh”, hatin yan her bi xwe anîna vîrûsa Koronayê jî bo
xwe bi “nê`imeteke îlahî” dizane.

Di demekê de li welatên pêşketî, deşthilat hemû cehda xwe dike da ku belkî bikare pêşîya be-
lavbûna Koronayê bigre, heyîya welat û bûdceya taybetî terxan dîkin bo wê ku îmkanatên
pizîşkî danê ber deştê xelkê, bajaran qerentîne dîkin, lê em dibînin di Îranê de hemû tiştek bi
berevajiye.

Rejîm ne tenê çî xizmeteke xelkê nake, ne tenê îmkanatên xwe paraştinê nade xelkê, ne tenê ba-
jaran qerentîne nekirin, belkî eve bi derfet zanî da ku bo xwe kasibiyê pê ve bike.

Rejîm di cehda hindê de ye ku rojane amara qurbanîyan zêde be, da ku hemû zilm û zor û dîkta-



torîya xwe bêxe stuyê Amerîka ku goya eve xetayê dorpêçên Amerîka ye halê xelkê Îranê wiha
perîşane.

Rejîm di cehda hindê de ye ku bi perîşan nîşandana rewşa welat, alîkariya dermanî û diravî ji
welat û Saziyên Cîhanî wergire. Her çi qas heya niha ji aliyê zaf welat û saziyan alîkarî bo Îranê
hatiye şandin, lê rejîmê deşt bi ser de girtiye û çî tiştek heya niha nedanaye xizmeta xelkê bona
kêmkirina xisara Koronayê.

Hevdem rejîm di jêr siya wê rewşa pir xirab a welat de û di demekê de ku hemû cîhan mijûlê
Koronayê ye, bi derfeteke zêrîn bo xwe dizane bê rawestîyan bernamên Navokî ên xwe bibe pêş
bi merema çêkirina çeka Navokî.

Korona bo rejîmê re bû derfeteke herî baş ku xwe li jêr barê berpirsayetiya wêraniya welat bi
sedema Erdhejê û rabûna Lehiyê û çendîn bûyerên dinê biavêje.

Mixabin li ber hebûna Koronayê, gelek derd û rojreşîya xelkê welat hatine jibîrkirin. Wekî
perîşanî û malwêraniya bi hegera erdheja li parêzgeha Urmiyê (Kotol) hate pêş. Wekî rabûna
lehiyê û ketina bin avê a dehan bajaran û sedan gundan li parêzgehên başûrê Îranê.
Belê cudahiya di navbera hikûmetên xelkî û pêşketî, digel hikûmetên dîktatorî û dijî xelkî de
eve ku hekî em beravirdekî di navbera rejîma Îranê û hikûmetên welatên pêşketî de bikin, gelek
bi başî eyan dibe.

Lê gelo ev rewşe dê heya kengê dom bike, girêdayê temenê Koronayê ye, bê guman ger ev
mêvanê nebixêr biçe, ez bawir im ev deşthilata dîktator û dijî xelkê jî dê di welatê me de bête
barkirin û biçe.

Nerîna Lîderan




“Donald Trump”:

“Hekî rejîma Îranê û girûpên girêdayê wê êrîşê bikine ser binkeyên hêzên Amerîka û kiryareke wisa bête encamdanê, Îran dê nirxeke giran bide”.



“Rupert Kelville”:

“Em daxwazê ji Îranê dikin ku li derheq mirina “Daniyal Ziyenelabidîn” û rewşa hepsiyên din di girtîgehê de bersiv bidin û zaniyariyan zêde bidine me”.



Ednan El-Zurfi:

“Min ti dîdarek digel Fermandê Giştî ê Spaha Pasdaran a terorîst tinebûye”.



Mihemed Baqirî:

“Me çalakîyên Amerîkayê xistine jêr çavdêriya xwe, lê me biryara destdirêjiyê tine”.

Kontîrolkirina “Corona”yê şiyana rejîma Tehranê nîşan dide!



N: Eskender Ceiferî

Rejîma Tehranê di heyamên derbasbûyî de nekarî “Corona”yê kontrol bike. Hem ji aliyekê ve xemsa bû û hem jî, ji aliyekê ve dixwaşt ji mijara “Corona” bo rakirina dorpêçên aborî li ser vî welatî mifahê bistîne. Lê belê “Corona” di encamê de kete ber malên berpirsên rejîmê jî. Gelek ji berpirsên rejîmê bi “Corona”yê ketine û hejmarek ji wan bi vî vîrûsê mirine.

Amerîkayê ragihandiye ku ewê ji bo rêgirîkirin li berfirehbûna “Corona” li Amerîkayê, rê li ber he-nardekirina kelûpelên pizîşkî bigirin. Ku ev jî bixwe bi awayekî raşteraşt bandorê dike ser Îranê.

Di demekê de ku Saziya Tendirûstiya Cîhanî dibêje divê welatên cîhanê ji bo rakirina qerentîne lezê nekin, lê rejîma Tehranê hewl dide rewşê normal nîşan bide da ku ji dawîya meha Xakelêwê ve xelk biçe ser kar û saziyên rejîmê û karmendên wê vegerin ser norma xwe ya berê. Lê di vî navberê de ne xelk ji wan qebûl dike û ne jî “Corona” disekine û gefên xwe li ser vî welatî kêr dike.

Hevdem li hin girtîgehên Îranê weke Seqiz, Mehabad û Ehwezê girtiyan serî hildan û ragihandin ku divê ji bo paraştina jiyana wan ji “Corona”, ew bêne berdan. Lê berpirsên girtîgehan û herwi-sa berpirsên bilind yên rejîmê guh nedan xwestekên wan. Gelek ji girtiyan ku diviyabû li gor yasaya nû ya ji bo paraştina girtiyan ji “Corona” bihatana berdan, lê nedihatîn berdan û di encamê de jî wan serî hilda. Nêzîkî 80 girti-

yan karî ji girtîgeha Seqizê birevin. Li girtîgeha Ehwezê jî hewleke hevşêwe hebû lê berpirsên girtîgehê gulle berdan ser girtiyan û di dencamê de bi dehan girtiyan jiyana xwe ji dest dan ku heya niha nasnameya piraniya wan nayê zanîn û rejîmê serdana heftane ya bo girtîgehê û hêlên telefûnê jî sekinandine. Li girtîgeha Mehabadê jî bi heman şêweyî girtiyan serî hildan. Lê girtiyek bi navê Danyal Zeynalabidînî ku beriya niha bi darvekirinê hatibû sizakirin, bi tometa hewldan ji bo reviyar ji girtîgehê bo girtîgeha Miyandoawê hate veguheştin û di bin îşkenceyê de jiyana xwe ji dest da.

Bi vî kiriyara rejîmê jî Komîsarya Bilind ya Mafên Mirovên Neteweyên Yekbûyî hate deng û rejîm şermezar kir û riswabûneke zêdetir bo rejîmê çê bû. Bi vî awayî hate xuyakirin ku rejîm ne dikare “Corona” kontrol bike û ne jî ji bo parastina xelkê û girtiyan ji vî vîrûsê karên pêwîst encam dide. Tekebura rejîma Îranê û guhnedana wan bi rênimayiyên tendirûstiya cîhanî di demekê de ye ku gelek ji berpirsên pilebilind yên cîhanê jî tûşî “Corona”yê bûne û dewletên cuda li vî rastiye mikur hatine. Bo mînak Angêla Mêrkêl şêwirmenda bilind ya Almanya û herwisa Bûrîs Canson serokwezîrê Bîrîtanya tûşî “Corona” bûne. Beriya deh rojan piştî civîneke Mêrkêlê, hate ragihandin ku têsta wê ya “Corona” erê bûye û ji wê demê ve derneketiye ber îkranê. Roja derbasbûyî jî şajina Bîrîtanya ragihand ku Bûrîs Canson hîn di qerentîne de ye û rewşa wî baş nebûye.

Di demekê de ku îsal berpirsên rejîma Tehranê ragihandibûn ewê rê li ber geştûguzara xelkê di sêzdekê de bigirin, lê belê xelk weke hersal li derve bû û bi vî awayî jî derewbûna îdiaya qerentîneya rejîmê li ber çavên civaka navdewletî derdikeve holê û xuya dibe ku rejîm bixwe sedema sereke ya belavbûna zêdetir ya “Corona” ye. Tevî vî jî Eyûb Şîrafetî cîgirê rêveberê polîsên Riyên Îranê dibêje îsal geştûguzara xelkê û derketina wan ya di roja sêzdekê de 64 jî sedî daketiye. Lê nabêje çavkaniya wan ji bo vî amarê çî ye. Ji ber ku heya niha amareke fermî di vî derbarê de nehatiye girtin û rejîm tenê dixwaze bêje ku wan qerentîne bi awayekî ciddî bicî kiriye. Li gor amarên ku berpirên cuda yên rejîmê belav kirine, heya niha 78 hezar kes li tevahiya 31 parêzgehên Îranê tûşî “Corona” bûne û di vî navberê de 6 hezar kes jî jiyana xwe ji dest dane. Lê ev di demekê de ye ku rejîm li mirina gelek kes jî ber “Corona”yê mikur nayê û di belgeya nexweşxaneyê de ku radeştî malbatan tê kirin, tê de tê nivîsandin ku sedema mirinê, nexweşiya bêhnvedan û nefesê bûye. Çalakvan jî dibêjin ku amara rastîn li Îranê dernakeve ji ber ku ew naxwazin xelk ji ber nebûna şiyana rejîmê bo kontrolkirina “Corona”yê serî hilde.

Di demekê de ku saziya Xwerekana Neteweyên Yekbûyî dibêje ji ber “Corona”yê, nîrxên xwarinan jî weke nîrxa Petrolê li cîhanê daketine, lê li Îranê rewş berovajî ye û nîrxên piraniya xwarinan bilind bûne. Ji aliyekî ve rejîm bixwe bo dabînkirina bûdceya serbazî û ewlehî ya terorîstên xwe nîrxên xwarinan bilind dike û ji aliyekî ve rê li ber wan kes nage-re ku xwarin li enbaran dane û niha nîrxên wan bilind dikin. Sedema rêgirînekirin li wan jî ev e ku ew bazirgan bertîlan didin rejîmê.

Ji aliyekî ve rejîm pîlan dike ku xelkê vegeirîne ser kar û zêdetir sîstem rastî kirîza aborî neyê, ji alî din ve wezîrê Tendirûstiyê, biryara wezareta Kangehan ji bo vegeandina xelkê bo ser kar weke metirsiyek bo ser jiyana xelkê binav dike û dibêje di demekê de ku ne derziya “Corona”yê hatiye çekirin û ne jî dermaneke misoger jê re hatiye dîtin, vegeandina xelkê bo ser kar metirsiyeke mezin e û divê qerentîne bi awayekî ciddî bê bicîkirin.

Îdam, cezayê xweser ê rejîma Îranê



N: Serbest Urmîye

Îdam wate ji holê rakirin û di esil de cezayek e ku bi sedema wê jiyaneke tê standin. Îdam weke yek ji girantirîn curê cezayan tê naskirin ku heya niha jî di gelek welatan de berdewam e. Di yasaya cezadayîna rejîma Îranê de jî serbarê nerazîbûneke berfireh him ji aliyê civaka navneteweyî û him jî ji aliyê çalakvanên medenî (sivîl) di seranserê Îranê de, heya îro jî hikmê îdamê netenê nehatiye hilûşandin, belkî roj nine ku nehatibe bireveçûn.

Di Îranê de îdam berî ku weke hikmeke yasayî were naskirin, pitir weke hikmeke xweser yê rejîmê tê dîtin. Ji ber ku heke em mêzeyî yasaya cezakirinê ya rejîma Îranê bikin, berî ku ew yasa hebe jî îdam bi awayekî berfireh hebûye (weke mînak îdamkirina çalakvanên siyasî û dijberên siyasî rejîma Îranê). Di vir de em dê bal bikeşînin ser yasaya cezayên Îranê ku bi navê yasaya cezakirina Îslamî hatiye pesendkirin û heke em kûr jê binihêrin di gellek cihan de tevî destûra bingehîn a vê rejîmê dijberiyê dike. Lewma meriv dikare bêje ku hikmê îdamê di Îranê de pitir hikmê xweser ê rejîmê ye heta hikmekî yasayî.

Yasaya cezayê Îslamî, çavkanî û destûra bingehîn a rejîma Îranê ye di warê cezakirinê de ku sala 1392'an a Rojî de, bi fermî ji aliyê meclîsa şêvraya Îslamî ya Îranê ve hatiye pesendkirin. Yasaya han sala 1386'an a Rojî, li gor esla 85'an a destûra bingehîn a rejîma Îranê hatiye darêtin. Li gor vê eslê, rê hatiye dan ku hin yasa

heya demekê ku meclîs destnîşan dike bê wê hindê ku werin pesendkirin û werin ceribandin, ku yasaya cezaya Îslamî yek ji wan yasayan e. helbet yasaya han di vî heyamî de bû sedema bi rê ve çûna hejmareke zaf ya îdamkirina welatiyan bi sedemên cur bi cur. Piştî hîlbijartina Hesên Rûhanî, weke Serok Komarê rejîmê, ku berê jî yek ji alîgir û biryarderê îdamê û nemazê îdamkirina tawanbaran li dema bi rê ve çûna nimêja Înê û ber çavên nimêjkeran bû, sala 1392qan a Rojî û li gor esla 123'an a destûra bingehîn a Komara Îslamî ya Îranê, bi awayê fermî çû meclîsê û hate pesendkirin.

Hikmê îdamê ku li gor maddeyên 286 heya 287'an ya yasaya navbirî yê bûye esleke sereke ji bo ji holê rakirina tawanbaran, bi êşkere dijberiya destûra bingehîn a rejîmê dike û gelek hikmên wê li dijî destûra bingehîn in.

Di madeeya 5'an ya yasaya cezayê Îslamî de dijberiya rejîmê û neparastina yekîtiya welat weke tawan hatiye û di maddeya 287'an de jî hikmê îdamê bo wan kesan e ku li dijî sîstema Komara Îslamî ya Îranê xebatê dikin. Eva di demekê de ye ku esla 9'an ya destûra bingehîn di beşa xwe ya dawiyê de wiha dibêje ku çî kesê mafê wê çendê çinine heta li ser navê parastina yekîtiya welat jî be, azadiyê ji çî kesê verbigire. Wate îdamên ku di yasaya cezayê Îslamî de li ser navê "miharib" tên kirin, li dijî destûra bingehîn a Îranê ne.

Ji aliyê din ve û li gor esla 23'an ya destûra bingehîn, her kes azad e ku xwediyê bîr û bawerî xwe be û nabe kes seba hebûna bîr û baweriyê cuda were cezakirin yan têkeve bin zextê. Lê ya ku heya niha hatiye dîtin, beşeke zêde welatî di seranserê Îranê de bi hêceta hebûna bîr û bawerîya mesebî li ser navê piropagende bo mesebeke cuda, li gor maddeya 286'an a yasaya cezayên Îslamî weke "mifsid fi -el- erz" hatine daliqandin.

Di wareke din de ku hejmara îdamê tê de zaf e û hejmareke zêde ji welatiyan her sal di Îranê de ji ber wê yekê tên daliqandin, pîrsa maddeyên hişber e. li gor maddeya 281'an ya yasaya ceza-



yên Îslamî, kesên ku kirîn û firotinê bi maddeyên hişber bikin, weke "miharib" tên naskirin û hikmê wan îdam e. dihalê de ku gelek pisporên yasanas di vî derheqê de nerazî ne û hikmê îdama wan hevvelatiyane li gor destûra bingehîn nizanin. Pisporên yasa nas ji bo ku biselîmînin hikmê han li dijî destûra bingehîn e, esla 20'an ya destûra han dikin belge û tede hatiye hemû hevvelatîyek di Îranê de divêt xwedî mafê wekhev bin di warên siyasî, çandî, civakî, aborî û...hwd de. Ew bawer in ku divêt di destpêkê de rewşa jiyana kesên ku ketine rêya maddeyên hişber de were mêzêkirin ka gelo rejîmê derfetek wiha ji wan re afirandiye ku karîbin bibin xwedî hemû mafên ku di destûra bingehîn de hatine û neçar nebîbin bo guherîna rewşa jiyana xwe û derbasbêkirina jiyana xwe û malbata xwe li xizanî û destkurtiyê jiyana xwe bixin metirsiye de. Yasa nas bawrin ji ber ku rejîmê nekariye erkê xwe li gor esla 20'an a destûrê bi cih bîne, lewma îdamkirina kesên han li dijî destûra bingehîn û xweser e.

Di dawiyê de ya ku pitir bala mirov dikeşîne eva ye ku maddeya 283'an ya yasaya cezayê Îslamî ya Îranê, destê dozger wate qazî vala kiriye ku bi keyfa xwe hikmê wan kesan bide ku li gor madeya 279'an şûn de weke "miharib" hatine nasandin. Li gor heman yasayê û maddeya 282'an, cezayê: 1. Îdam, 2. Xaç kirin, 3. Birîna destê rast û pêyê çepê, 4. dûrxistin, ji wan re hatine diyarîkirin.

Cezayê 5 sal hepsê bi ser welatiyekî Kurd de hate sepandin

Welatiyekî Kurd bi navê “Şakir Bêhrûzî” xelkê Gundê Dizê li herêma Mirgewer, ji aliyê taya 2` a dadgeha binav şorişa Îslamî a bajarê Urmîyê bi dozgeriya “Şêxlû” bi 5 sal hukima te`zîrî hat cezadan.

Taya 2` a dadgeha Înqilabî a bajarê Urmîyê, ew hukime bi sûçê “Endam bûn li yek ji partiyên Kurd yê dijberê rejîma Îranê” bi ser de hatiye sepandin.

Li gorî çavkaniyeke aghdar di girtîgeha bajarê Urmîyê de, Şakir Bêhrûzî, Roja 9`ê Xakelêwê, bi sûçê “kuştina yek ji endamên sipaha pas-daran” li taya 1` a dadgeha nizamî a bajarê Urmîyê, bi



serokatiya dadwer “Berizkar” hatiye dadgehî kirin, û bi wî tohmata xistine situyê wî heya niha nehatiye selmandin, û dadgehî kirina navbirî dubare bo du mehên din hate paş êxistin.

Ew welatiyê Kurd, Roja 21`ê Reşeme a sala 1397`an, ji aliyê hêzên Îtla`atê we hatibû dest-biserkirin û piştî derbasbûna salek û 9 rojan bi ser girtina wî re, li oda take kesî a sipaha Elme-hdî a bajarê Urmîyê ve, bo girtîgeha nawendî a wî bajarî hatibû veguhestin.

Hin kesên dût ji pirensîpên jîngeheparêziyê hirçek di bajarê Urmîyê de kuştin

Çend kesekî xelkê gundê Melûnê li herêma Bira-dost a girêdayê bajarê Urmîyê gelek hovane hirçeke kêvî kuştin.

Wan kesan gelek hovane û bêrehmane, ee hirç zecirkuj kirin, û bi şanazî ve film û wêne ji wê cinayeta xwe girtine û di nav torên civakî de belav kirine.

Hirç û pareke dinê ji ajelên

kêvî gelek kêmane û mix-abin tixm û nesla wan ber bi nemanê ve diçe.

Xelkê Kurdistan bona parastina ciwanî û dewlemendiya Kurdistanê di warê jînge û hebûna ajelên kêvî de, dibe hemû xwe berpirsyar bizanin û çand û kultûrekê bigirine berahika xwe ku cihê şanaziya hemû gelê xwe bin.

Jîngeha Kurdistanê hewcehî



bi parastinê heye û her Kurdek dibe xwe di hember parastina jîngehê de berpirsyar bizane.

Bila em her bi xwe nebîne sebebê jinavbirina hemû ciwaniya Kurdistanê, jîngeh jî bi ajelan ciwan e.

Bêguman ew karê wan çend kesên gundê Melûnê cihê şermê ye û dût ji pirensîbeke jîngeheparêzî ye.

Yekîtiya Pîşeyî ya Mamostayên Kurdistanê Îranê rohnkirinek belav kirin

Wezareta Perwerde û Hînkari ya rejîma Îslamî ya Îranê, bona pêşgirtin ji belavbûna Koronayê, dixwaze ji rêya bikaranîna “App” a “Robîka” bi awayê zindî, waneyan bo dersxwazan bide, lê ew “App”e bona sîxurîkirinê ye.

Yekîtiya Pîşeyî ya Mamostayên Kurdistanê Îranê li ser wê hewla rejîma Îranê bo wanegotina zindî rohnkirinek belav kir.

Di wê rohnkirinê de hatiye baskirin, ku Wezareta Perwede û Hînkari ya rejîma

Îslamî ya Îranê, aghdariyek belavkiriye ku di 16`ê Xakelêwe a sala 1399`an de polên wanegotinê li ser asta Îranê



bi awayê zindî di sîstema “Robîka û Bat Şad” de dest pê dike.

Ew tora civakî a “App”a “Robîka û Bat Şad” e, ku

toreke ewlehiyê ye û di bin kontrol û çavdêriya Spaha Pasdaran a terorîst de ye ku û Spaha Pasdaran a terorîst ji birêveber û mamostayên xwendingehan daxwaz kiriye ku wê Appê li ser mobayil û leptapan dabezin û nasnama xwe di wê sîstemê de tomar bikin.

Herwisa di wê rohnkirinê de hatiye baskirin:

Ji ber vê yekê ku ew “App” û torên civakî, ji aliyê rejîmê ve hatine berhevanîn û standard nînin û piraniya wan bona sîxuriyê ne.

Hewl bidin wê “App”ê li ser mobil û leptapên xwe yê sexsî nedabezin. Dibe birêveberên xwendingehan leptapên taybet terxan bikin, ber wê yekê ku di dema dabezandina wê “App”ê de, hemû zaniyariyên mobil û leptapan, ji aliyê tora civakî a “Robîka û Bat Şad”ê ve tê kontrol û çavdêrîkirin.

Ew mamostayên ku di dabezandina wê “App”ê de şareza nînin, bila ji mamostayên şareza û cihê baweriyê alîkariyê wergirin.

Yekîtiya Pîşeyî a Mamostayên Kurdistanê Îranê

Hunermedên Kurd piştgiriya xwe bo Îtalyayê nîşan dan

Hejmareke hunermendên Kurd ji bo piştgiriya xelkê Îtalyayê ku zêdeyî du hefteyan e ji ber vîrusa koronayê di karantînê de ne, strana ‘Çaw Bella’ gotin.

40 hunermend Kurd ji bo piştgiriya gelê Îtalyayê sirûda “Bella Ciao” ku bi Kurdî bi navê ‘Çaw Bella’ hate amadekirin, gotin û li ser medyaya civakî belav kirin.

Hunermendên kurd ki di nav çend hunermedên weke Hesên Şerif, Mizgîn Tahir, Hozan Aydın, Diyar Dêrsim,



Xelîl Xemgîn, Seyitxan, Kawa, Rotînda, Serhat Çarnewa, Heja Turk, Dilovan û Ayfer Duzdaş di nav de ji bo piştgiriya gelê Îtalyayê ya ku ji ber koronavîrusê bi hefteyan e, di karantînayê de ne, ew stran gotin.

Di dawiya klîbê de bi Kurdî û Îtalyanî ‘Sepre sîamo însîeme – Em dê her dem bi hev re bin’ hate nivîsandin. RÛDAW

Xangul Musêrzade stranbêja Kurd a xelkê bajarê Xurasanê koça dawiyê kir

Daye Xangul ku bi Xangul Musêrzade dihate naskirin li sala 1320 a Rojî (1941 a Zayînî), di gundê Ûxaz a girêdayê bajarê Şîrwanê a ser parêzgeha Xurasanê ji dayîk bû. Xangul Musêrzade di temenê zarokayetiye de dayîk û bavê xwe ji deşt dide.

Xangul Musêrzade di hin civînan de gotibû: “Dema ku min 4 meh temen hebû, min bavê xwe ji deşt daye û dema ku ez biçûk bûme min dayîka xwe jî ji deşt daye. Xaltikên min, ez mezin kirime. Dema ku ez hinekê mezin bûm min deşt avête kar kirinê. Me di nav rezan de kar dikir, û min hevalek hebû navê wê Medîne bû û di cejnan de Hacî Norûziyek hebû ku dihat ez û Medîne dibirin 2 tûmen dida me û me jî wî re stran disitrandin, em gelek hejar bûn ji ber vê yekê me ew karê han dikir.

Zarotî û ciwaniya Xangul Musêrzade bi kar kirin di nav rezên Xurasanê de derbas dibû. Xangul Musêrzade belkî jineke hunermend bû, lê du caran jî di jiyana xwe de mêr kiribû û rastê şikestê hatibû û ji ber vê yekê êdî jiyana bi tenê hilibijart.

Xangul Musêrzade bi zimanekî resen û bi awyêkî baş bi zaraveyê Kurmancî strand dixwendin û di vê warê de



mamoştayeke baş bûye. Dema ku stran distrandin bi bêhneke baş û bi awyêkî dilêş û dilhebîn digot.

Xangul Musêrzade hejmareke zêde ji stranên Kurmancî di nav sîngê wê de hebûn, lê mixabin bi sedema wê ku kesî piştewaniya wê nekir, ji bilî yek albûma bi navê “Strana Jinên Kurmanc”, ku hate zebtkirin û tomarkirin, êdî çiyê din nehate tomarkirin.

Xelkê zêdetir Xangul Musêrzade jina stranbêja Kurd a Xurasanê, bi stranên wê yên Lorî nas dikirin.

Xangul mînanek bû bo jinên Kurd ku bo çanda xwe xebat dikirin.

Mixabin ew jina stranbêj di encamê de di 28`ê Reşemeya 1398`an de di temenê 79 saliyê de bo hertimî lorî û çand û stranên Kurdî bêne jêr axê û çû ser dîlovaniya xwe.

Binpêkirinên mafê mirov li meha Xakelêwe ya Îsal di Rojhilatê Kurdistanê de

Hepsiyekî siyasî ê Kurd li girtîgeha Merîwanê bo girtîgeha Sineyê hate veguhaştin

Roja Pêncşemî 14'ê Xakelêwe, “Tehsîn Dadres”, hepsiyê siyasî ê Kurd û xelkê gundê “Serdos” a ser bi bajarê Merîwanê, di girtîgeha wî bajarî de bo girtîgeha navendî a bajarê Sineyê hate veguhaştin.

Pêka gotina çavkaniyeke aghedar, ew hepsiyê siyayî ê Kurd bi sedema wê ku hevkarî digel navendên hikûmetî ret kiriye, ji aliyê Cihgirê Berpîrsê Îdareya Îtîla`ata bajarê Merîwanê ve ketiye bin givaşan.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Çendîn car e ku berpîrsên îdareya Îtîla`atê digel çûna wî hepsiyê Kurd bo mirexesê dijayetiya kirine.”

Ew hepsiyê siyasî ê Kurd, sal 1397`an bo derbaskirina hepsiya xwe bo girtîgehê hatibû veguhaştin û di wê heyamê de, ji mafê mirexesiyê bêpar bibû. Êvara roja Pêncşemî a 9`ê Sermawez a 1396`an, “Tehsîn Dadres”, bi tohmata “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên opozisiyon ên hikûmeta Îranê”, ji aliyê hêzên Îtîla`atê ve hatibûm binçavkirin û piştî heftiyekê li ser binçavkirina navbirî de bo îdareya Îtîla`ata bajarê Sineyê veguhaştibûn.

Navbirî, meha Gelawêj a sala 1397`an, di dadgeha destpêkî de, bi tohmata “hewldan li dijî tenahiya netewî û hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên opozisiyon ên hikûmeta Îran”, bi 11 sal hepsa te`izîrî û piştî ew cezaye di dadgeh pêdaçûne a bajarê Sineyê de, bi 6 sal hepsa te`izîrî hate guherîn.

“Tehsîn Dadres”, hepsiyê siyasî ê Kurd, di dema binçavkirinê de, li destpêragihîştin bi parêzer hatiye bêparkirin.

Çalakvanekî Kurd yê jîngehparêzî bi 6 sal hepsa te`izîrî hate cezadan

Taya 101 a dadgeha “Keyferî” ya 2 a bajarê Şinoyê, çalakvanekî jîngehparêz, yê bi navê “Reşîd Nasirzade” kurê Fetah bi 6 sal hepsa te`izîrî ceza da.

Dadgehê ew çalakvanê jîngeparêzî, bi tohmata “Kombûn û têkdana ewlehiya navxwe û çalakî û bangewazîkirin bo girûpên dijberên nizamê” ceza daye.

Dadgehê li gor madeyên 500 û 610 di beşa yasaya te`izîrat û pêşgirtin li tawanên yasayê ceza ya Îslamî; ew çalakvanê jîngeparêz bi tohmata “Kombûn û têkdana ewlehiya navxwe û çalakî û bangewazîkirin bo girûpên dijberên nizamê” bi 5 sal hepsa te`izîrî û herwisa bi tohmata “propagandeyên dijî nizmê” bi salek hepsa te`izîrî ceza da.

Sepandina ceza li ser wî çalakvanê medenî yê Kurd de, li gor raportên îdareya Îtîla`ata bajarê Şinoyê û me`imûrên qezayî yên dadseriya giştî û înkîlabî a bajarê Şinoyê bûye.

Ew çalakvanê medenî bi tohmata “sîxurîkirin bo girûpên dijberî hikûmeta Îranê” bi piştgirêdan bi esla 37 a yasaya bineretî û madeya 4 a ayînî a dadresiya keyferî bê tawan hatiye naskirin.

Ew cezaye roja Pêncşemî 7`ê Xakelêwe, bi Reşîd Nasirzade re hatiye ragihandin.

Ew çalakvanê jîngeparêz, roja Sêşemî 12`ê Sermawez a sala 1398`an, di dema ku li herêma Kurdistanê wegeriya di rêya bajarê Pîranşar-Şinoyê, ji aliyê hêzên Îtîla`atê ve hate binçavkirin.

Reşîd Nasirzade, roja Pêncşemî 26`ê Sermawez a wî salî, piştî 44 rojan ji ser binçavkirina wî re, bi danîna barimteya 200 mîlyon tumenî hate azadkirin.

Di sala 98`an li Îran û Kurdistanê de 37 hevwelatî bi sedema teqîna mînê jiyana xwe ji dest dane yan jî birîndar bûne

Bi piştgirêdan bi amara tomarkirî li navenda amarî a “Mîn û Zindigî”, 37 hevwelatî bi sedema teqîna mînê li heyama sala derbasbû di Îran û Kurdistanê de canê xwe ji dest dane û birîndar bûne.

Li ser hev di wê amarê de, 9 hevwelatî bi sedema teqîna mînê canê xwe ji dest dane ku di parêzgehên wekî “Xûzîstan, Goliştan, Urmiye, Sine û Kirmaşanê” de bûne.

Di wê amarê de, 6 kes ku temenê wan jêr 18 salî bûne bi sedma teqîna mînê birîndar bûne.

Bi piştgirêdan bi wê amarê, piraniya birîndarbûyên mînê, ling û destê wan jê bûne û bûne kêr endam.

Di 42 haletên bûyera teqîna mînê û alavên teqemenî ên şer di Îran û Kurdistanê de, sê halet bûne sedema jinavçûna pez û terşan.

“Mîn û Zindigî”, di warê zaniyarîgihandin li derheq agehdarkirina metirsiyên mîn li parêzgehên ku tûşê mîn bûne çalakî dike û hewila belavkirina rapor û nûçe li derheq bûyerên teqîna mîn û alavên teqemeniyên mîn dide.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (371)



Pêşewa

Qazî Mihemed

yekemîn serkomarê Kurdistanê

Em hemû li ser rê û şopa Pêşewa Qazî Mihemed in



Dezgeha Giştî a Ragihandina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê
Media Department Of Kurdistan Democratic Party of Iran